Çewtiyeke balkêş di helbestê de

Nîzamettîn Akkurt

Ger di helbestê de ji aliyê naverok an jî ruxsar ve çewtiyek hebe, ew tiştekî taybet e û her wiha bi wê helbestê ve girêdayî ye. Lewma mirov divê li ser kêmasiya wê helbesta ku bûye mijara gotinê bisekine. Helbet ji sekinandinê qesda min vekolîneke wêjeyî ye û bi saya wê kêmasiya helbestê astengkirina kêmasiyên heman in, ku dibe pêk bihên. Ev li ser navê helbestekê kêmasiyek e. Ji ber vê çendê em dikarin bipeyitînin ku ne tiştekî giştî ye. Lê belê dema ku em bibêjin di helbestê de çewtiyek, wê demê ew ne taybet e, giştî ye.

Ez weke xwendevanekî helbestê, dema ku helbestekê dixwînim bala min dikişe ser gelek tiştan. Ew tişt hinek bi daneyên helbestvan ve, hinek jî bendewariyên min ên ji helbestê ve girêdayî ne.

Jixwe xwendevan jî tenê ji aliyekê ve li helbestê nanêre. Yanî ev têkiliyek e ku di navbera xwendevan û helbestê de hatiye avakirin. Di nav seqaya vê têkiliyê de ne xwendevan dikare li hember helbestê xwe tune bike û ne jî mafê helbestê heye ku bi heman şêwazê tevbigere. Bi ya min divê

HELBEST

herdu alî jî di heman navbeynê de bin. Ne bendewarên xwendevan bibine raser û ne jî helbest xwe bike raser an jî rajêr. Helbet ev du alî ne ku weke pratîkî têne beramberî hev û danûsitandinekê ava dikin. Ev danûsitandineke bizanebûn e û xwe nasipêre zoriyê.

Lê em ji bîr nekin ku ev herdu aliyên ku em weke xwendevan-helbest bi nav dikin, bi hev dihesin û bi danûsitandinekê di navbera xwe de hevsengekê ava dikin, tenê peyda nabin di wê mêzêna nexuyayî de. Her çende ku em nikarin weke aliyekî sêyem qala wî bikin jî, di bingeh de li ser herdu aliyan jî bandoreke nexuyayî heye, ku ew jî siya helbestvan e.

Di vir de a girîng ne ew e, ka bandora helbestvan li ser helbestê, bi vê ve girêdayî li ser xwendevan divê hebe yan na. Em bixwazin û nexwazin jî bandora helbestvan tiştekî daringî ye. Ji aliyê bandorê ve ev tiştekî xwezayî ye. Gelek azîneyên vê yekê hene. Ji aliyê helbestvan ve azîneya herî serkeftî bi rengekî nexuyayî bandorçêkirin e.

Û di vir de ev mijara ku weke serenav li vê nivîsê hatiye kirin derdike ve pêşberî me. Yanî di helbestê de bandor an jî raseriya helbestvan. Ez bawer im kesek tune ku rabe û bibêje bila bandora helbestvan di helbestê de tune be. Ev ne tiştekî mimkun e. Ji ber ku helbestvan raman, hest û hîskirinên xwe diçîne nav helbestê. Weke xwezayî jî xwendevan biparastin an jî bêparastin dikeve nav wê çemberê.

Ji bo xwendevan a girîng an jî ya tirsnak ne bandora helbestê ye. Jixwe xwendevan bi awayê zirxkirî helbestê pêşwazî nake. Çendî ku bi misogerî tevdigere jî, li bende ye ku weke erênî hinek tiştan werbigire. Lê hêvî nake ku tiştên neyînî jî werbigire. Dema ev tiştên wiha dertê pêşberî wî ew ajoya xwe ya parastinê dixe piratîkê.

Ji vî aliyê ve divê helbestvan gelek baldar be, daku bandora xwe dixwaze erênî, dixwaze neyînî xwendevanê xwe aciz û dilteng neke. Xwendevan weke xwezayî naxwaze ku helbesta dixwîne wî dilteng bike. Jixwe mafê helbestvan tune ku vê yekê bi xwendevanê xwe re bike.

Raman, hest û hîskirinên helbestvan çi dibe bila bibe, xwendevan azad e ji helbestê çi digire û çi nagire. Lewma ti mafê helbestvan tune ku li ser xwendevan serdestî û raseriyekê ava bike. Ger ava bike, ew tê wateya desthelatê. Veca ku di têkiliya xwendevan û helbestê de, -weke aliyekî nexuyayî- di bin zordariya desthelatê de be, ew ne têkiliyeke rast û dirûst e, di ser de jî ji wê têkiliya masum a xwendevan-helbestê derdikeve.

HELBEST

Ez li gelek helbestvanên me dinêrim, dikevin vê kêmasiyê. Tiştekî pir ecêb e, dihêlin ku ez carna matmayî bimînim. Helbestvan helbesta xwe dixwîne, tu dibê qê şanogerek e, derketiye ser dikê û ne helbestê, metnekê şanoyê dixwîne. Ev çî şêwaz e, nizanim. Li ti devera cîhanê mînakeke wiha tune. Ez bi xwe jî gelek hez dikim ji xwendina helbestê. Lê belê hezkirina min ji xwendina normal re ye. A ku ez qala wê dikim, awayê xwendineke ecêb e. Yanî helbestvan nikare awayê xwendina helbesta xwe li ser xwendevan ferz bike. Lê helbestvanên me ferz dikin, heta tiştekî balkêştir, peyvên helbesta xwe ne bi gora hûnandina helbestê, bi gora awayê xwendina xwe dinivisînin. Carna peyvan, ji bo ahengê dubare dikin, dirêj dikin, li hev badidin… Ev çî tişt e? Ecêb!

Bi ya min dibe ku ez şaş bim jî, ev bandora helbesta erebî ye. Ji ber ku em dizanin, helbesta erebî di bin sî û tesîra Quranê-pirtûka îslamê- de heta îro hatiye. Awayekî xwendina wê heye.

Dema ku em li helbesta Rojava-Ewrûpa dinêrin tiştekî wisa tune. Tenê di dema Yewnana Antîk de hostayên gotinê hebûne û bi rengekî xweşik helbestan xwendine. Ji ber vê çendê ez dibêjim ku ev bandora xirab ji Başûr-cîhana Erebî- hatiye û hinek helbestvanên me, yên Başûr û Başûrêrojava vê yekê weke tiştekî erênî pejirandine. Merc û şertên pejirandina vê çi dibin bila bibin, ev çewtiyeke mezin e ji bo helbestê. Ger ez xwendevanê helbestê bim, divê ez azad bim, ku karibim awayê xwendina helbestê diyar bikim. Mafê helbestvan li ser min tune, ku awayê xwendina xwe ya helbesta xwe ferz bike. Helbestvan çiqas bikeve nav fêlbaziyan dê ewqas ji helbestvaniya xwe dakeve. Qesda min ji fêlbaziyê ew e ku, ev xusarê xwendina helbestê di bingeh de veşartina qelsiya asta helbestê ye. Ez wisa têdigihîjim ku, di helbestê de gelek qelsî hene, helbestvan bi awayê xwendina xwe dil heye ku wan veşêre. Dema ku ez wê helbestê dixwînim, kevaleke pir cuda di mejiyê min de şênber dibe. Yanî him ew kevala ku helbestvan dixwaze di mejî û dilê min de binexşîne pêk nayê û him jî, ez bi lawaziya wê helbestê dihesim. Lewma li zora min diçe, wisa li min tê ku, ez ketime dafika helbestvan. Her wiha ez difikirim û ji vê têkiliyê aciz dibim. Gelo wê rojek bê, ku ew helbestvanên me jî ji vê desthelata ku dixwazin li ser xwendevan ava bikin, aciz bibin? Nizanim, lê wê rojê pir meraq dikim.

HEVBÎST